

# BERBANG

KOVARA FEDERASYONA KOMELÈN KURDISTANÊ LI SWËD



## NAVEROK

Pirsê n cuwanê n dinê .....	3
Parlementoya Ewrûpayê	
cuntaya faşist rîcimand.....	4
Parastkarê n Natoyê ji cunta	
faşist ra gotin erê! .....	5
Biji 1 Gulan .....	6
Bona biranina Mîkayêlê	
Reşit.....	7
Me Leyla Oasim ji bir	
nekiriye.....	9
Pertokê n hêja û gîranbuha...10	
Derwêş Ebdulle.....	11
Serhildana Şêx Seid wê di	
dilê me da tim biji.....	14
Agahdari li ser cîvinê n	
federasyonê .....	15
Dî şerê cihanê yê duwemin	
da mîrxaseki kurd.....	16
Helbest.....	17
Sawcîyek kurd li ser	
kurda diaxîfe.....	18

Berpîsyar  
A.BAWER

Pergala Rûpelan  
M.A.GILLY

Raxîstîma Nîvisaran  
SELİM

Redaksiyon  
H.ARAS  
ROHAT  
F.REZAQ  
BIRİNDAR  
M.A.GILLY

**BERBANG**  
Kurdisk tidskrift, utges av  
Kurdiska Riksforbundet. Ansv-  
arlig utgivare och Redaktör:  
**A.BAWER**. Layout: A.M. Gilly.  
Sättning: **SELİM**

**ADRESS**  
Kurdiska Riksforbundet,  
RISSNELEDEN 55,NB  
172 44 SUNDBYBERG/SWEDEN  
TEL:08/984553

Prenumeration: Medlemmar  
50 - kr/år Övriga 100 - kr/år  
Postgiro 64 38 80-8

Xwendevanê n hêja,

Piştî kongra Federasyona Komelên Kurdistan Li Swêd ya 5'an, hejmara yekem ji xwendevana ra pêşkêş dikin. Vê hejmara hanê hînek derengi ket. Lî, dereng ketina vê hejmarê ji sedemên tekniki û kurtayıya wexte. Ji ber ku kongre wê dî meha Heziranê da car dim çê bibe.

Em hêvidarin, ku wun li me negrin û alikariya xwe ji Berbangê ra nişan bîdin. Jindariya her kovareki grêdayî alikariya xwendevan û niviskaraye.

**BERBANG**

**BERBANG**

Kovara Kurdi, Xwedi Federasyona Komelên Kurdistanê Li Swêd.  
Buha: 5 Kron.  
Abona saleke: 50 Kron, 30 DM.

**NAVNIŞAN**

Berbang, Rissneleden 55.NB  
172 44 SUNDBYBERG/SWEDEN  
Tel: 08/984553  
Postgiro 64 38 80-8

# Pirsên Cuwanêne Dînê

Wek ku tê zanin, sala 1985 an ji ali Yekitiya Miletan salacewanen hate êlankirin. Lî çar ailiyê dînê ewê pirsên cuwanan bê şirovekîrin, munaqêsekîrin û eşkerekirin. Û dî meha Tebaxê da ji, lî Yekitiya Sovyet li Moskov wê şahiye (festival) cuwanen dinê bê pêkanin.

Dî jiyanı mirovda dema xortani ciheki giring dîgre. Jî ber ku dewra xortani dewra têghiştinê, zaninê û kemilandinê ye. Dema xortani berge lî pêsiya mirov fireh dîke û dî warê zanin fam û firaset, sin'et û ceribandînê da pêşketinek lez peyda dîke. Lê bî karanina dewra xortani ji pir giringe! Lewra, pêşketina mirov ne tenê girêdayi cuwaniyê ye. Ew, girêdayi sistema civakiye. Eger ji bo têghiştin, pêşketin, fêrbûn û saxiya mirov mecal û imkan hebe, pirsên xortan bi hêsanter çare lê dibe. Lê wextê ev imkan tunebin, ji bo xortan jin dibe wek severes û dî nav xortan û civatê da dubendiyek peyda dibe. Jî ber vê yekê, mirov nîkare pirsên xortan ji sistema civaki, maddi û çinayeti cûda bifikire.

Îro di welatên kapitalist da parastkarê kapitalizmê lî gor kar û armancen xwe, lî gor ideo- lojiya xwe sistemek peyda dîke.

Sermayedar tucar ji bo pêşketina karker, gundi, xebatkar, xortan û hwd. naxebîte. Ew tim ji gel xulamti û parastina sistema xwe dixwaze. İdeolojiya wi mîjîyen kole, desten girêdayi û stuxwari dîparêze. Û berdevkên sermayedaran pirsên xortan ji pirsên çinayeti û civaki dîqetinim û dixwazin rûçikeki dîn bidin vê pirsê. Lê, ji bo çarelêkirina pirsên xortan ji ti fersend û olax çê nakin. Vê rewşê gelek cara xortan ber bî serhildanê va dikşine. Sermayedar serhildan û pêkoliya xortan ji meselîn çinayeti, feqiri û betaliyê cûda şirovedike û bala xortan ji meselîn abori, siyasi û civaki dûr dixe.

Dî sistema kapitalist da tucar armanc ne mirove. Jî ber vê yekê, birçibûn, feqiri û betali gêjaiya heri mezine. Îro lî welatê kapitalist bî milyonan betal û birçi hene. Jî van betal û birçiyen perçeyek giring ji xortin. Û ev rewş dî nav xortan da serhildanen cûre-cûre dide xuyakirin. Hinek jê dîkevin ber çerxa kapitalizmê û ber bî xerabiyê va dimeşin û dibin dilê meyxuri, ero-in-efyon- esrarkêşi, qumarbazi, dizi û berederi. Sermayedar ji rewşek weha dixwaze. Lewra, ew baş dizannin ku ji mirovên

weha zirar çê nabe. Lê, lî ali dîn gelek cara piraniya xortan li gel karker, gundi û xebatkaran cihe xwe dîgre. Û dizannin, ku azadiya wan, pêşketina wan di guhertina sistemê da ye.

Welatên sosyalist numûneye- ke ji bo çarelêkirina pirsên karker, gundi, xebatkar, xortan û hwd. Sosyalizm, ferqiya nava çin û tebeqan radîke û pirsên gel ji bingehi safi dîke. Ew, di her wari da fersend û mecal peyda dîke. Jî ali abori, siyasi, ciwaki, çandi, zanin, xwendin û nivisandin û rehetiyê va ji her kesi ra fersendek wekhev dikemile. Xort ji, bî her hawê nîsibê xwe dîgre û di warê ilim, edebiyat, sin'et, spor û çandi da xurt dîbe Sosyalizm, ji bo rehetiya mirov dixebîte û ji bo hemû mirovên dînê dahatûyek baş peyda dîke. Û ew tim aşiti û birati dixwaze. Xorten xwe ji bî vê exlaqê terbiye dîke.

Dî Tîriyê da, ji despêka cumhûriyetê vîrda burjuvazi, ji bo dewlemediya xwe xebîtiye. Û ji bo xortan ji, ideolojiyek ni-jatperesti bî karaniye. Lê xorten Tîriyê û Kurdistanê ji sala 1960'i vîrda ketiye nava pirsên civaki û siyasi. Ew lî diji emperyalizmê faşizmê û kolonyalizmê şer dikin. Jî ber vê yekê ji,

burjuvazi bî taybeti jî xortan gelek aciz dîbe û dijminatiya wan dîke. Dî Tîrkiyê da wextê ku gel azadi daxwazê, demoqrasi dixwaze û lî diji kedxwariyê tê, burjuvazi dî nava van daxwaziyan û welatên sosyalist da tê-kiliyek datine û bala gel bî ser taluka "komunizmê" û "kurdhayetiyê" dikşine. İrorejimafaşist, goya jî bo pîrsên xortan seferber bûye!!

Bî sedan xort hatun kuştin, bî hezaran dî zindanan û êşkencyanda ne. Rejima faşist çawa hemû gel jî mafê demoqratik bê par kîr, wusa jî xortan jî vê mafê bê par hîst. Zaningeh, dibistan û hemû cîgehêñ xwendin

û ilim bûne hêlina kevneperestiyê. Rejima faşist, mirovîn emîrber, destgrêdayi, xulam û tipêñ robot dixwazê...

Sazûmana faşist, bî vê zordari, nijatperesti û xwinmijiya xwe wê dikaribe bigihije armanca xwe? Dirok şahidi nake, ku bî darê zorê miletêk hatibe tîrsan û tekoşina wi hatibe fetisandin.

Heta ku birçibûn, belengazi û zordari hebe; heta bî hezaran xort di zindanan û êşkencyanda bin; heta ku mafê demoqratik û siyasi di bin kilitê da be û bî milyonan betal hebin jî ti pîrseki ra çare nayê ditin û ev rewş çîqa dom bike, ewqas e-wê pîrs zêdetir û girantîr bibe.

Û bê guman wê sazûmana faşist bî serê xwediyê xwe da hîlweşe.

Çarelêkirina pîrsên cuwanêñ me, girêdayi rîzgariya gelê me ye. Jî bo rakırına birçibûn, belengazi, betali; jî bo pêşketinâ çandi, edebi, ilmi, sin'etkari û zanistiya xortan, hevkariya tekoşina gelê me pêwiste. Lewra, heta welatê me dî bin nirê kolonyalistan da be, heta çanda me, zimanê me û hebûna me dî bin qedexe û asimilasyonê da be azadiya xorten me ji tune. Jî ber vê yekê, cihê xortan lî bal gelê me ye. Rojêñ azad û serifraz girêdayi viya ye. Şikandîna zincirêñ koledariyê û pêşveçûnê girêdayi vi tekoşinê ye.

## PARLEMENTOYA EWRÜPAYÊ

CUNTAYA  
FAŞİST  
RICIMAND !

Parlementoya Ewrûpayê dî 19'ê Nisanê 1985 an dî lî Strasbourg'ê civinek pêk ani. Rojeva civinê Tîrkiyê bû. Wek ku tê zannin, Parlementoya Ewrûpayê jî welatên ku endamê AET'yê ne pêk tê. Dî civinê da zordariya cunta faşist hate mahkûmkirin û jî bo rûreşkirina cunta faşist bîrŷareki giring hate qebûlkirin Lî gor vi bîryarê: Dî Tîrkiyê da heqê mirovati ketiye bin lingan; lî ser sendikayan, aşitixwazan, ronakbiran, rojnamevanan û hwd. zordariyek gîran tê ajotin; êşkencyen nediti berdewame. Aliyê gîringiya vê bîryarê ewbûku cara yekem bîzimaneki vekiri zulm û teda ya ser gelê kurd hate ricimandin. Jî bli vana, jî bo ku dî Tîrkiyê da zordariyên anti-demoqratik bê rakîrîn bala welatên ku endamê AET êne hate kîsandin. Û jî bo ku enda-

mên AET'ê zor bîdin Tîrkiyê bîryar hate girtin.

Nûnerên Tîrkiyê jî bo ku pêşî lî van bîryaran bîgrin geleç xwêydan rêtin. Û dî rojnama "Huriyêt'ê da lî diji van bîryara wek se yê har qîçê xwe beş dikirin û weha dîgotin: "Parlementoya Ewrûpayê hat listikê komûnistan".

Jî berê va, hemû hukûmetên Tîrkiyê jî bo ku mesela gelê kurd bin doşek bîbe tî listik nemaye ku cerîbandine. Lê, wê armancêñ kolonyalistan dî qırıka van da bîmine. Lewra, mesela gelê kurd êdi lî hemû dinê bîlav bûye. Û tî qewetek nikarê pêşî lî tekoşina gelê kurd bigre. Ewê ev buyer hê gelek cara kolonyalistan ne rehet bike û xewnê wan bîrevine.

ji cunta  
faşist ra  
gotin  
erê!

# PARASTKARÊN NATO'yê

Konsey a Ewrûpayê dî navbeyna 22 û 26'ê Nisanê da li Strasburg'ê civîya. Rojeva civînê Türkiyê û rewşa Türkiyê bû. Civin bî munaqêseki dijwar derbas bû. Nûnerên komunist û sosyalist dî axaftinê xwe da, lî ser heqên mirovati; demoqrasi; qedexeyên ku lî ser sendiqâ û partiyên politik; teda ya ku lî ser gelên Türkiyê tê ajotin û bî taybeti ji, lî ser rawşa gelê kurd sekîn û cunta faşist ricimandin. Lê nûnerên kevneperest û parastkarê Nato'yê yêن Muhamfazakar, Liberal û Xiristiyan Demoqrat bî her hawê piştgiriya cunta faşist kîrûn û dî Türkiyê da hebûna demoqrasiyê parastin. Dî axaftinê xwe da weha gotin: "Ku Türkiye ji Konseyê bê avêtin, wê Türkiye ji Ewrûpayê dûr bikeve û evya ji NATO'yê ra xisarek mezinê." Nûnerên Muhamfazakar, Liberal û Xiristiyan Demoqrat cafdîn dijminatiya xwe ya gelan û hevalbendiy a zordar, faşist û xwinmijan aşkera kîrûn. Dî civina Konsey a Ewrûpayê da menfeeta NATO'yê hate parastin û prensibên konseyêne kete bin lingan.

Civin bî piraniya dengen endametiya Türkiyê qebûl kîr û ji bo Qebûlkırına endametiya Türkiyê gelek xwêdan hate rêtin. Dî civina konsey a Ewrûpayê da berdevkê cunta faşist Şêx Kamûran Înan bû. Wek ku tê zanîn, Şêx Kamûran bî eslê xwe kurde û ji Bidlis'ê ye. Lê mixabin, kurdê weha xwefiroş û xayîn ji hene û heta ev tekoşin


dom bike wê xayînê weha de-rênen.

Nûnerên komên komunist û sosyalist gelek vekiri zordariya cuntayê rûreş vê bîyare protesto kîrin. Nûnerên Avusturya' yê H.Hesele û Norveç'ê Liv A-sean, barbaryâ ku ser gelê kurd tê ajotin mehkûm kîrin, lî diji cuntayê û pêgirtiyê wan rawwestiyan û dî axaftinê xwe da weha gotin: "Türkiyehêbûna 12 milyon gelê kurd ji qebûl nake. Mirov çawa dikare bejê dî Türkiyê da demoqrasi heye!" Nûnerê Partiya Karkerê Ingiliz P.Hardy ji: "Qebûlkırına endametiya Türkiyê şâştiyek mezinê û bî vê hawê prensibê konsey a Ewrûpayê dîkeve bin lingan" got, û rexneyek hîşk lî konsey ê girt.

Heyetek ji çepên Türkiyê û Kurdistanâ Türkiyê çûn Strasbourg'ê û bî nûnerên Konseyê ra dan û satandin çêkirin. Lî ser rewşa Türkiyê û Kurdistanê raporek bî zimanê inglizi hate belavkirin. Dî 23'ê Nisanê da lî ber derê Konseyê xwepêşandanek hate pêkanin û lî ber tabût û sedarê nobetek temsili hate girtin.

Bî kurtayı, civin lî gor daxwaza NATO'yê pêk hat. Konsey a Ewrûpayê ji bo xatrê NATO'yê û pêgirtiyê wi, prensibên xwe da bin lingan. Qebûlkırına nûnerên Türkiyê rûmeta Konseyê dî dinê da wînda kîr, emrê cunta faşist dirêj kîr û ji barbaryâ cuntayê ra çavê xwe girt.

bijî



# GULAN

1 Gulan cejna karkeran ya navnetewi ye. Cejna piştgiri, yekiti û tekoşinê ye. 1 Gulan dî tekoşina çîna karkeren dinê de ciheki giring digire. Tevgera çîna karkeran lî dinê, rasti dawiya sedsala 18 an tê. Tevgera karkeran cara pêşin lî Ingiltere wek: "Dî warê politik de demokratik kırina mafê hîlbijartînê" derket meydanê. Ev proletarya di sala 1848 an de lî gelemeperiya Awrûpa roleke mezîn list.

Dî sala 1871 an de lî Fransa yê tevgera proletarya geleki bî pêş ket û giha bergeha standına dewletê. Cara pêşin lî Fransa yê dewleteke proleter ava bû. Lê ev biserketin jî ber kembûna dinamizma hinduri û nehûnana proletarya felesi û cardın dewlet kete destê burjûvazi.

Lî Amerika, çîna karkeran di 1 Gulan 1886 an de lî bajarê Chicago jî bo 8 seet kar û hin mafên demokratik yên din. li berxwedanek lî dar xistin. Ev li berxwedan her ku, çû firefir bû û bajarên "Newyork, Dhicephbia, Loisville, Saint Lois, Milwanhe û Baltimore" xist bin bandora (tesir) xwe. Bûrjûvazi, Jî vi tevgera çîna karkeran vecinîqî û bî her awayi êris bir ser

karkeran. Burjuvazi gelek jî karkeran girtin û ew xistin bin darê lêdanen. 4 nûnerên karkeran ji bî dardakirin.

Kongra karseren sosyalist yê enternasyonal, dî sala 1889 an de civiya û roja 1 ê Gulanê wek roja çîna karkeran ya navnetewi diyar kir. 1. Gulan jî wê rojê û bi vir de, her sal ji ali karkeren dinê de tê piroz kîrin.

Lî Rûsyâ yê tevgera karkeran geleki bî pêş keti bû. Paşê sala 1917 an de şoreşek proleter lî dar xistin. Ev şoreş dî tevgera çîna karkeran de bergehek heri bîlind e.

Şoreşa 1917 an, dûrişma "Karkeren hemû welatan yek bin" fireh kir û kir "Karkeren hemû welatan û gelên bindest yekbin". Bî vê navê 1 Gulan ne tenê jî ali karkeren dinê her wusa jî ali gelên bindest de ji tê piroz kîrin.

Çîna karkeren kurdistanê ji, biserketina çîna karkeren dinê parçek jî tekoşina xwe ditiye, ew piroz kîriye û dî vê riyê de xwe geleki êşandîye.

Lî Kurdistanê, çîna karkeran dawiya sedsala 19 an çêbûye. Lê belê hebûna koledariyê, dî

pêsiya pêşdeçûna çîna karkeran de bû asteng, rîneda ku tevgera karkeren Kurdistanê ber û pêş bîce. Dî navbera salênen şerê cihanê yê yekemin de piraniya xebatkarê kurd, dî meydanen şer de telef bûn, lî Kurdistanê nehiştin ku, hacetê çandiniyê berûpêş bîçin. Hebûna koledariyê, dî ber tekoşina karkeren Kurdistanê de astêngke mezinê. Pişti parvekîrna Lozan ê 1923 an, diktatoriyâ Kemalist ya burjuvazi, bî xwinê kete Kurdisatanê lî hember her daxwazek demokratik, bî zor û xwinê hat rawestandin. Zagonen nemirovti jî bo netewa kurt hatin derxwîstîn. Lê lî hember her tade û astengan, burjuvazi nikari bû tekoşina çîna karkeran rawestine. Dî sala 1927 an de karkeren riyâ hesin lî Nisêbinê dev jî kar berdan û mafêن xwe yên demokratik xwestin.

Çîna karkeren Kurdisatnê bi pirani pişti Şerê Duwemin yê Cihanê, bû xwediyê imkanen pêşketinê. Lê tekoşina çîna karkeran pişti salênen 1950-1960 i bergehêñ nû bî dest xistin.

Rewşa karkêren Kurdistanê geleki dijwar e. Jî ber tunebûna kar û bîhayiya jiyanê, pergala karkeran pir dijwar e. Jî ber vê

rewşa dijwar, bî hezaran karke-  
rên kurd, dev jî welatê xwe ber-  
dane û derketine welatên Ewrû-  
pi û welatên din. Jî bo debora  
xwe, lî van welatan bûne miha-  
cir û bî rojmizeke (yewmiye) er-  
zan keda xwe difroşin. İro lî  
welatê Tîrkan, lî bajarêng wek  
İstanbul, Ankara, İzmir, Adana  
gelek karkerêng kurd dî rewşeka  
dijwar de dixebitîn. Yêng ku dî  
bar û karê gîran de bî rojmizeke  
erzan dixebitîn bî pirani Kurd'  
m. Jî bo ku, birçi neminin û de-  
bora xwe bîkin, xwe didin ber  
her karêng dijwar û dî bin vê  
rewşa nemirovti de têng perçi-  
qandin.

Me isal yek gulanek dîn lî paş  
xwe hîşt. Lî welatê me dijmin û  
koledar nahêlin em bî serbesti  
cejna Yekê Gulanê piroz bîkin.  
Cejna Yekê Gulanê hatiye qe-  
dexê kîrin da ku karkerêng  
kurd bî doza xwe nehisin û wê  
jî bir bîkin. Dîvê cejna karkerêng  
dînê û gelêng bindest de ku, em  
piroz bîkin, dijmin û koledar  
weke her car û jî berê bêhtir  
êrişî ser doza netewa kurd dî-  
kin, bî hezaran gelê me dîkujin  
û lî hember her daxwaza mirov-  
ti bî xwinê bersiv didin me. Bî  
vê sitemkariya xwe, eşkere di-

kîn ku ew neyarêng karker û ge-  
lêng bindest in, neyarêng miro-  
vatîyê ne û ne mirov in.

Lê karkerêng kurd yêng ku, jî  
welatê xwe der ketîne, vê cej-  
na firaz (mukkaddes) ref bî ref  
piroz bîkin û hebûna xwe diyar,  
bîkin, lî doza xwe bî xwedi der-  
dikevin. Bî hezaran karker des-  
têng xwe didin hev, lî hember  
emperyalizmê û koledariyê  
dengê xwe bîkin yek û bî  
yek ilmi diqirin û dibêjin:  
Biji 1 Gulan Cejna Karker û  
Xebatkar!

## BONA BİRANINA

### MIKAYÊLÊ REŞİT



Gava em helbesteke baş dî-  
xwinin, carna nîzanin jî xweyê  
wê helbestê saxe, yan mîriye.  
Eger ew şîr başe, em jê lezete  
distinîn û razibûna xwe didine  
helbestvan. Em wi helbestvani  
qe nas jî nekin, ew helbestvan  
hebe jî, tunebe jî, şîra wi heye  
û wê şîr haqasi biji, çıqası, ku  
ew baş hatiye nîvisarê. Bî seri  
wê şîrê em wi qimet dîkin.  
Û gava em pê dîhesin, ku hel-

bestvan saxe, şâ dibin, jî ber ku  
xweyê wan xeta wê disa şîrêng  
baş bînivise, lê eger helbestvan  
idi tune, her kes me hindava  
xweda ber xwe dîkeve, ku ser  
şîrêng wi idi yêng teze wê zêde  
nebin.

Lê gava tu bî xwe wi helbest-  
vani nas dîki û zani ew xet çawa  
xuliqine, ku ewi çıqas xebat kî-  
riye bona gel û pêşdaçûyina li-  
teratûrayê, miroveki çıqas

maqûl, intêrnasionalist û şirhe-lal bûye, bona mirina wi du bare ber xwe dikevi. Dibêjin, ku berê ewlin mirov bona mirovê xwe ber xwe dikeve, weki giva xelqê xerib haqasi ber xwe na-keve, weki "xwin nabe av". Lê na, kê çi dixwaze bira bêje, bona mirina Mikayêlê Reşid ev gotina pêşîya ji bêçare û bêta-qete. Wextê xêra wi didan, cimeta kurda got: "Serxweşi cimeta wi dikeve...".

Belê, ser şîrêd Mikayêlê Reşid idi yêd nûh wê zêde ne-bin. Lê çi ku ewi pey xwe hiştiye, ew ji bese, ku meri herro bixûne û jê têr nebe. Meri dikare ev herdu xetê wi bixûne û weki dirêj ser bifikire û jê têr nebe:

Milet kulilkêd reng-rengine,  
Her Milet bina xwe tine.

Lê çiqas û çiqas xetêd wiye haye ji hevdu çêtir hene, Ü çawa, ku em demeke dirêj dikarin

bona wê şîrê sabîn, ew ji wedeki dirêj ser wan xeta şâ bûye û bawerim, ku ser wan xetana pir serê xwe êşandiye, hetani ew xuliqine.

Belê serxweşi cimeta wê dikeve, çimki, ew lawê cimeta xweyi şirhelal bû û hetani kutasiya jiyana xwe ji bona gel xebiti. Ew ji nexweşîa dîlik çû. Lê ew mirov ji dîlik dije, bin singê kijanida dîlik heye, Dilkê wi zûda nexwêş bû û ewi zanibû, ku eger iro bona gel hineki kêm bixebeitê, dibe hineki dirêj biji. zanibû, ku filan xebat dikare nava sehetekêda bike, lê nava sê sehetada dîkir, zanibû, ku kesekê bona wê yekê wira tiştek nebêje, lê ew usa hatibû terbiyetkîrinê, zanibû, ku dibe tiştek pêra negihine, ji vê dinê here û deqa kutasiya xwe, ji xwera bêje... "Çima ez filan rojê du sehetâ kêm xebitîm?".

Ewi diefirand, çimki nîkaribû neefranda. Bi zimanêd kurdî, rûsi û ermeni dînîvisi û bi wan zimana gelek berevokêd şîera bi pirtûkêd cihê-cihê li Yerêvanê, Moskow derketin. Hê-saye meri bêje: "pirtûkêd wi li Moskow derketinê". Derketin û nava çend rojada hatne firotanê. Dêmek, bi seri şîrê wi gelek cimeta nasiya xwe dane şureta niviskarê kurdê Sovyêt û dewlemendtiya erf-edet, xeyset, deb û zargotina gelê me, ku nava gelek şîrêd wida bi hostati hatibûne nitirandinê. Lê çiqas şîrêd wi kovarêd soviyêtistanê û Komera Ermistanê, kovar û rojnamêd kurdîye welatêd derekeda hatine çapkîrinê.

Hiç cara bi destanînê xweva babax ne dibû, lê mina zara şâ dibû. Şâ dibû, ku gotinêke kurmanci yê xalis dibihist. Usa qewimibû, ku gava teze destpê kîribû şîr dînîvisin, kurmanci rînd nizamibû, lê haqasi xwe êşand, ku rîdaktori (berpirsyari) şîrêd helbestvanê meyi bi nav û deng dîkirin. Dixwest ji her kesi hini şorêd kurdi yê wi ra ne eyan bibe, ji gundiya, roşimbira, lo hela ji zara ji dixwest baş hini zimanê kurdi bibe. Ecêbeke mezîn nine, ku yek rînd kurmanci zane, lê ew yek ecêbe, ku tu hinbi û bîbi hel-bestvaneki wê cimetêyi e'yan.

Gava em çed hevalan va li bajarê Moskow bona pîsekê rasti helbestvanê rûsayî eyan A.Dêmînîtêv hatin û ew pê hesiya, ku em kurdin, aha got: "Hûn Mikayêlê Reşid nasdîkin? Ew hevaleki mini heri ezize, me tevayı institûta Moskavoeye li-tîratûraeye ser navê M.Gorkî'da xwendiyê. Ew serekê qursa me bû, nav meda yê heri zên û zêrek ew bû. Aliyê minda wi silavkm".

Ewi cimeta xwe hız dîkir:

Hezar dijmîn, hezar neyar,  
Çawa gurê birçi û har,  
Dizêrandin cimeta min,  
Jêra danin kul û mirin.

Ewi Oktyabré hız dîkir.


Disa usa bi zemana,  
Cimeta minê bextreş bîma  
Herkê nebûya Oktyabra geş,  
Ku rê vekir boy emrê xwes.

Çiqas şâ dibû ku yek mala wê diqesidi. Carna min jêra digot: "Ez herim, xebata te geleke, te şerpeze nekim". Digot: "Kuro, lê ev xeberdanâ me ne xebate? Tu hati, nanê me bixwe ku kîfa min bê, weki ez baş binivisim". U gava ji mala wi diçüm, tîlêfon dîkir, digot: "Ew xebera kurmanciye te got, xebereke geleki başe, lê ezê hinekê mayin jê pîrskim...".

Mikayêlê Reşit baharê, meha Adarê, çend roj beri cejna Newrozê çû ser heqîya xwe. Wê mehî, ku jiyan, tebiyet ji xewa gorê hîşyar dibin, dar kulilk dîdin, kulilk dibîşkivi. Vê baharê ew kulilk wê ser gora wi ji şinbin û bin-boxsa wan wê bîghiye dîlkê wê, ku nava temamîya jiyana xweda bona cimetê xebiti û sekini.

Ez hatime dinê, ezê rokê herim,  
Ez hatime, weki şabim û we şakim.

Belê, tu şâ bûyi, te me şâ kir.  
Tê hela gelek wext me û silsileta şaki, lê sed heyf û sed korani, ku tê mera tevayı şa nebi.



# Me Leyla QASIM Jı bir nekiriye

**LEYLA ŞEHİD**

Diroka Kurdisatnê gelek cara qehremaniyêن bê hempa ditiye. Jı van qehremaniyen ne tenê mîrên kurdistanê par distin, wusa ji jinêن kurd xwedi pareki hêjane. Çawa, ku do û iro dî tevgerên neteweyi da lî Vietnamê, Angolayê, Qemboç-yayê, Gineyê, Cezayirê, Filistinê, Nikaragüayê û hwd. jîn dî sengeran da, dî cepheyen da parçeki şoreşê bûn; di hêmû serhildanêن Kurdistanê da ji, keç û jinêن kurd wek şeran di gel bav û birayêن xwe û zilamêن xwe gelek nimûneyêن qe-remaniyê nişan dane û iro ji nişan dîdîn. Lewra, gelê kurd evindarê azadiyê û welatê xwe ye. Ew, bî mîr û jinêن xwe va ticar lî ber dîjmîn seri dananine û ji dîjmîn lavayiya nekirine. Û ew, ji xwe ra ji azadiyê bî rû-mettir tiştek nedine.

Jı şêrên keçêن kurd yek ji Leyla Qasim'e. Leyla Qasim hê dî zarûtiya xwe da bir û baweriya welatparezi nas kir û bû şervaneki azadiyê. Dî dema xwendevaniya xwe da dest bî kar û xebatêni siyasi kiribû û wextê, ku dî zaninge (Universite) Bexda'yê da dixwend ji, bî çalaki ya xwe bûbû kelemê çavê dîjmîn. Leyla, dî vê demê da ha-

te girtin û car dîn ronahiyê nedît! Piştî girtina Leyla, dîjmîn serê ewîl bî dek û dolava xwest, ku wê ji tekoşinê bîdîn vegerandin. Jî bo seri pêlkirina Leyla gelek rî hatin cedîbandîn. Lî, kolonyalist bî tî hawê negîhiştin armancêن xwe û xuşka me Leyla ji baweriya wê ne hat vegerandin. Ew ji gelê xwe û doza xwe ra xîyanetê nekir. Tevi ku gelek cuwan bû ji, berxwedanek bê hempa nişan da û bî eniyek vekiri, bî baweriye xurt çû mirinê. Û ew ji bo gel û jinêن kurd bû ala berxwedanê û şervaniyê.

Leyla Qasim dî 13 Gulan sala 1974 an da bî destê Baas'a xwin-mij hate sêdarvekirin. Lî, dî dilê me da Leyla nemiriye û wê tim biji. Ew dî hemû beşen Kurdistanê da bûye nimûneyek berxwedanê. Iro ji, lî hemû beşen Kurdistanê bî hezaran keç û jin ala destê Leyla bîlind dîkin û ji bo rîzgariya welatê xwe şer dîkin, bê westan xebat dîkin. Bîlam xuşka Leyla û bî hezaran şehidêne me dî tîrbênen xwe da bê xem razê. Gelê kurd xwina şehidan lî erdê nahêle û wê tim şehidêne xwe bî bir bine. Wê navê şehidan, dî diroka Kurdistanê da ciheki bî rûmet bigre!

Şêr şêre, mîre yan jîne  
Nişan bî dest, Leyla mîne  
Polaye dîl wek asîne

Leyla kîye?  
Leyla jîne  
Leyla mîne  
Leyla mîne...

Leyla mîne, Leyla welêt  
Wê dîl lî min kîr ar û pêt  
Mîzgin lî Kurd roja me têt  
Dîjmîn jî tîrsan maye şêt

Leyla çîye?  
Leyla jîne  
Leyla mîne  
Leyla mîne..

Leyla delal û pir çeleng  
Leyla ciwan û şox û şeng  
Xwe daye kuştin wek pileng  
Şêre lî nav kurd daye deng

Leyla kîye?  
Leyla jîne  
Leyla mîne  
Leyla mîne...

Bî wê lî kurd ron bûye şev  
Jîn bûne wek Leyla me tev  
Îdi nema hêjaye rev  
Ey kurd de destan bîdne hev!

Leyla kîye?  
Leyla jîne  
Leyla mîne  
Leyla mîne...

# **PERTOKÊN HÊJA**

## **Û**

# **GIRANBIHA**

12-IV-1985  
Qanatê Kurdo  
Lêningrad

Dî jiyanâ min zanyarida çar caran zanyareki kurdên Kurdistanâ parevekiri ez şa û kêfxwêş kîrim. Ew zanyar zanyarê Kurdistanâ Turkiyê bû. Ez bî xwe ji ji wi welatime, hergav mîla min lî ser hal, hewal û rewşa Kurdistanâ Turkiyê bûm.

Min gotarêñ rojnaman, kovaran, kitêb û pertokêñ rêbaran dixwendin, dixwest pê bîhesim, gelo çawane hal hewalê kurdên her çar parêñ Kurdistanê. Li paşı şerê dînyayê duwemin deng basê kurdistana Turkiyê ji mera hatîbû girtinê, em haj pê nin bûn, me nîzan bû kurd lî welatê xweda hene, dijin, çi dikin, çiqasîn, zimanê xwe dizanîn, kultura xwe xwedi kîrine, yan ji bî destê zorê xwerû û serxwebûna netewetiya xwe wunda kîrin. Goveka koneperestêñ tîrkan Kurdistan kîribûne hebsxane, komandosên xwe lî welatêñ Kurdistanêda cikribûn, rê girtbûn ne dîhişt merivêñ welatêñ

wê ser hevda herin, bêñ, hev bîbinin, arikari hev bikin. Wana usan ji ne dîhişt rîbar, rojnamevanêñ Evropayê li Kurdistanê bîgerin, melumetiyân lî ser wê binivisin, elam bikin. Propaganda faşistên tîrkan bî vir û derewan xelq didane inekîrinê, ku kurd li Turkiyê tunene, ku xelqêñ Anadoliyêñ gîş tîrkîn. Ku piraniya xelqê wêderê tîrkêñ serê çiyane. Rojnamevan, kovarnîvisêñ Evropayê, xasîma yê welatê Sovetê, ew vir û derewa bawar dikîrin û gelek caran ew dîwekilandin, em-zanyar û ulmdar ji dîxalîfin, me nîzanbû gelo bî rasti kurd di Turkiyêda ne mane, gîşkan zimanê xwe ji bir kîrine, bûne tîrk. Gelek caran em dilêş û xemgin dibûn, me haj bayê dinê nibû em haj rewşa birêñ xwe kurd lî Kurdistanâ Turkiyêda nin bûn. Dilêşî, xemgini û tefekûriya min lî ser rewşa kurdêñ Kurdistanâ Turkiyê li axiriya salêñ 1969 - 1970 da

xîlas bûn. Berê pêşin lî nav van salanda cara pêşin xemên dilê min belav bûn, çaxê hevaleki kurd ji Evropayê ji minra Mem û Zina Ahmedê Xani û perto-ka Alifbayê kurdi ji minra şandîn. Ez pê hesiyam, ku ev herdu nîvisar lî nav agir û alavêda hatînê çapkîrinê, ku çapkerê wan Mehemed Emin Bozarslane, hîngê Min nîzanbû, ew kiye, çi merîye, lê çaxê çavê min bî van herdu kitêban ketin, ez pê hesiyam, ku çapkerê wan mîreki çeye, bêtîrsi û be-xofi kîriye, xwe daye ber girtinê, lêdane û zêrandine, bo xatirê vejinandîna Mem û Zina Ahmedê xani nemiri û bo ro-nak kîrina neteveyê kurd li Turkiyêda ewi xwe canfida kîriye. Herdu kitêbêñ wi ez bê hed şa û kêfxwêş kîrim, ez pê hesiyam, ku lî Kurdistanâ Turkiyêda kurd mina berê hene, dijin, dixebeitin û şer dikin bo xwexweti û serxwebûna xwe, ku

# RAPORA KOMİTA KARKER JI BO KONGRA İSTİSNÄİ

Geli mivan û guhdarê n eziz,  
nûnerê n hêja!

Hûn hemû bî xêr û xweşî hâtine u ez li ser navê Federasyona Komelên Kurdistan li Swêd we hemuya bi girami silav dikim

Hevalno! Piştî Kongra me ya 5'an, li vir em disa civiyane û kongrak din çê dikan; Konrak istisnai. U wek hûn ji dizanın biryara vê konrê ji di kongra 5' an de hatî bû girtin.

Hevalno! berî ku rapora kar û bar pêşkêşî we bikim, dixwazim bi kurtayı be ji, li ser rewşa cihanê û ya Kurdistanê bisekinim.

Di dirokê de, cihan tu cari wek iro nêzî tahlûkak mezin ne bûye. Ev tahlûke ji, ji Emerika Yekbûyi û ji sistema imperialist tê. Imperialistên Emerika dixwazin ku di riya çekdariyê de serdestiyê têxin desten xwe û bî vê riyê pêrgiyê li pêşdeçûyi na dirokê bigrin. Loma ji her roj mesrefen çekdariya xwe zede dikan û her çekdariya xwe xurttir dikan. Emerika Yekbûyi dixwaze ku serdestiya xwe ya çekdariyê ne bes li ruyê pêk bine, ew her wisa dixwaze ku vi serdestiyê bigigine asimanan ji. Yanı Emerika xebat û haziriya şerekî li asimanan, şerrê siteyrikan, dike U cardin wek hûn ji dizanin, iro hêzên kevneperest, karina Reagen bi hawaki eşkere qala mumkuniya şerrekî nukleer yê herêmê dike. Bê guman tişteki wisa wê dawiya insanetiye be, tu kesê ku di vi şeri de qe-

zenc bike tuneye.

Emerika Yekbûyi, ji ahkî de çekdariya xwe bî vi rengi xurt dike, lê ji alyê din de ji di hemû warî de êrişa dibe ser sistema sosyalist û hemû hêzên pêşverû û aştixwaz.

Iro li cihanê vatinîya heri mezin eve ku, divê mirov li dij êriş û çekdariya Emerika û hêzên kevneperest derkevin, Piştî giri û alikariya hêzên pêşverû û aştixwaz bikin û aştiyê bî xurti biparêzin.

Hevalno! gelê me li her çar beşen Kurdistanê ji di bin zulm û zorek hov û nedîti de diji. Bi taybeti li Kurdistanâ Tirkiyê, Iran û Iraqê rewşa gelê me gelek xirab e. Li Kurdistanâ Tirkiyê ev nêzî pênc salaye ku gelê me di bin diktatoriye faşist de diji vê diktatoriya faşist hetanî iro gelek zirarêne mezin da gelê Kurd û Tirk, bi hezaran kesen pêşverû û welatparêz avêt binen zindanan û bî sedan ji kes kişand ser daren sêpiyê û çol û çepalan gullebaran kir. Hemû maf u azadiyê demokratik ji navê rakir û di dewsa wande faşizm bi ci kir. Generalen faşist, Tirkiyê û Kurdistan kirine wek çışleyek leşkeri û dixwazin ku gelê Tirk û Kurd ji wek leşkeran idare bikin. Vê diktatoriye, ne bes di warê siyasi û demokratik de jîyan li gelên me na kiriye zindan, wan her wisa di warê abori de ji jîyan li gelên me na kiriye zindan. Miov dikare bêje ku iro li Tirkiyê û li Kurdistanê feqiri, bêkarî bûye perçak ji jîyana rojê û xelak bi dizi dest pêkiriye.

Bê guman zulm û zora cûntayê, kirinê cûntayê ne van minkekên ku me li jor dan tenêne. Carê berî her tiştî, hebûna

vê diktatoriya xwînrej di Rojhîlata Navîn de ji bona hemû gelên heremê û hêzên pêşverû tahlûkak mezin e. Ü hetanî ku ev cûnta li ser hukum be wê ev tahluke her berdewam be. Erişen beşen Kurdistanê yên din ji vê yekê re minak in.

Li Kurdistanâ Iran û Iraqê rewşa gelê me ji ya Kurdistanâ Tirkiyê pirr ne baştır e. Li van her dû perçen Kurdistanê ji gelê me her roj tê kuştin û gund û bajaren Kurdistanê bombarduman dibin. li van her du perçan ji gelê me ji hemû azadî û mafen demokratik û netewi bê pare.

Ev nêzî pênc sala ye ku di nabêna Iran û Iraqê de şerrekî li dij menfeetên her dû gelan û ne heq dom dike. Di vi şerri de bê guman gelên her du aliyan ji zirarêne gelek mezin ditin. Lê zirara ku gelê Kurd diyê, ger ji ya wan ne zêdetir be ne këmtir e. Kurdistan di nav van 5 salen borî de, him ji bo rejima Iran ya kevneperest û him ji ji bo Saddamî diktator û xwefiroş bû qada şerê wan. Her du diktatoran ji ji ali xwe de Kurdistan bombarduman kirin û belê me duştin û xwina wan herikandin. Ev kuştin, ev hoviti iro ji bê nabêna hin dok dike Mirov dikare bêje ku rewşa gelê me berî şer cardin xerab bû, lê di şer de hin ji xerabitir bû.

Li Kurdistanâ sîri rewşa gelê me, iro ne bi vi rengi be ji, lê cardin ji hemû mafen demokratik û insani bê par e.

Em zêde dirêj nekin, li her çar perçen Kurdistanê ji halê gelê me gelek xerab e. Divê ev rewş bê guherandin.

Nuha ji em werin ser rewşa Federasyonê. Wek hûn ji diza-

\* Me di 28'ê Adarê de bi berpirsiyarê ABF(Stockholmsdistrikt) Martin Koff û berpirsiyareke SIV re civinek ji bo hazir kirina kursek ji bo komelên endam çê kir. Armanca kursê ev bû ku wê di vê kursê de hin agahdariyên esası ku komele çawa têن idarekirin bê dayin. Ev daxwaza me di ci de hat diyin û biyar hat dayin. ku dema em bixwazin ewê ev kurs bê hazir kirin. Wê ji her komelê du kes karibin di kursê de beşdar bin û ji bona du rojan alikariya maddi ji bigrin. Me Komita Karger bîyar da ku vê kursê piştî Ilonê çêkin.

\* Ji Komita Karger du heval di 20 û 21 ê Adarê de çûn ketin civina Sturrereferensgrupp.

\* Me di 1 û 2'ê Nisanê de têن Federasyonê kişand. Ev tiştana, (kitêb û Berbang) ji ber ku ciyê Federasyonê tune bû, me bir li mala hevaleki endamê Komita Karger danii Cardin wek hûn dizanin çapxana Federasyonê ji hebû. û ev çapxane ji wek tişteñ din di xaniyê berê (Tunnelgatan.14)de bû. Ev em mecbûr bûn ku çapxanê ji wir derxin, yan bifroşin, yan ji li derekê bi ci bikin.. ciyekî Federasyonê tune bû, ku me lê daniya. Di dawiyê de me bîyar girt ku bifroşin. Me hemû komelên endam agahdar kirin, ku em çapxanê difroşin. Ji nav komelên endam yek, komela Nacka got em dikirin û me ji firot wan. Dema me firot çapxane ne dixebeitu.

\* Me muracaatên ji bo Berbangê û ji bo alikariya xebatê kirin. Muracaatên me na hinek bi derengi ketin, lê em dikarin

bêjin ku ev cara yekem bû wisa bê këmasi dibû. Anglo me hemû daxwaziyên SIV bi cih anı. Sebebên derengcistina me ji ew bû. Ev ji bû sebebê derengiyê.

\* Me di 28'ê Nisanê de bi Komita jinan re civinek çê kir. Di vê civinê de ji 5 komelan nûner û hin kesen serbixwe hebûn. Armanca me bi vê civinê ev bû ku, komelek demokratik û li ser bingehêki fireh ava bikin. Piştî vê civinê me bi komita jinan re tû civinê din çê nekir. Lê me informasyon girt ku, bîyar gitine ku komelek jinan ava bikin. Ev Komite nuha haziriya avakirina komelê dike. Du komelên endamê Federasyonê xwe ji vê xebatê paşde kişandin.

\* Wek tê zanin di orta meha Nisanê de li kampa Sundsvall girevek birçibûnê hate çê kirin. li ser vi girewî çend caran bi berpirsiyarê kampê re û kesen keti bûn girewê re em peyivin û me piştgirîya hin daxwazin wan kir. Cardin li ser vê bûyerê me di 24'ê Nisanê de presmedelandek ji da rojnaman. Ev pressmedelanda me di rojnaman de çap bû.

\* Em ji bona ciyekî mezintir û baştir xebitin û hin ji dixebeitin. Ji bo vê yekê em çend caran bi ABF re peyivin. Li ser vê yekê di 10'ê vê mîhê de ABF civîneke bi hin komelan ve çê dike, emê ji divê civinê de beşdar bibin.

\* Em di 1'ê Gulane de bi hawaki girseyi beşdar bûn. Di vê meşa 1'ê Gulane de bêl 3 komelan, hemû komelên din û gelek kesen serbixwe di bin bandrola Federasyonê de cî gitin û meşîyan.

\* Me û du kes ji kampê Sundsvall di 23'ê Gulane de civinek bi nûneren Anita Gradin re li ser rewşa kampan çê kir. Di vê civinê de Federasyon li ser du tiştî sekini, yek, rewşa kampa, dudu sebebên grevên birçibûnê. Ne başuya kampan qebûl kirin, lê gotin ev ne karê me ye mesela zû bersiv dayine, yan qebûl kirina iltica siyasi, gotin, ger di grevande insan ji bimre em cardin dev ji qanûnen xwe bernadin. û ev yek ne bes ji bo Kurdane, ji bo hemû kesi wisa ye.

\* Me destûra Federasyonê ji nû ve nivisand li komelan bela kir.

\* Me heta iro wek sekreterya heftê careke û hemû endamên Komita Karger ji ji du hefta carek civin çê kiriye

\* Me divê her meh hêjmarek Berbang derxista, lê me heta nuha bes su hêjmar derxist.

Geli nûneran! xebata me kiriye bi kurtayı ev e Dil dixwest ku me hin bêtir tişt bikra û ev ji bî kadroyen jêhatî dibe Em hêvi dikein ku wê ev kongra me ya istisnai karibe van kadroyen baş hilbijêre û divê hilbijêre ji. Ji ber ku iro hewcedariya gelê me ji piştgiriyê re ji alikariyê re heye. Divê em Federasyona Komelên Kurdistan li Swêd li gel hin vatiniyên xwe yê Swêd, karibin vê alikariyê ji bona gelê xwe ji komunîstan bigre hetanî dêran(kilise) bigrin. Ev kar ji bî Federasyonek bi hêz dikare bi serkeve.

Biji Federasyona Komelên Kurdistan li Swêd.

nin ev 5 sale ku Federasyona Komelên Kurdistan li Swêd hatiye ava kirin. Avakirina Federasyonê li Swêd, ji bo Kurdan qezenceke, qadeke demokratik e ku hatiye bi dest xistin. Divê em, hemû Kurdêن pê şverû û welatparêz vê qadê, vê mewziya demokratik xurt bikin, fi-reh bikin û bi hemû hiza xwe bi parêzin, lê xwedî derkevin.

Iro li Swêd ji bo kesên biyani gelek imkan û mafên demokratik heye. Lê ji bona sitendina van imkan û mafên demokratik ji xebat divê, hêz divê û beri her tiştî ji rêxistin divê. Dema ku em nexebitin û em ne bi hêz bin, bê guman ji van imkanan yekî ji em ê nikaribin jê fêde bibinin û ji xwe tu bigre hema hema tu fêdeyê nabinin ji.

Geli mivan û nûnerên eziz! Me li jor got ku, ev nêzî 5 salaye ku Federasyona me ava buye. Bê guman avakirina Federasyonê ne tişteki kêfi bû, ji rêxistinek wisa re hewcedarı hebû, daxwazek wisa hebû û loma ji ev federasyon hat avakirin. Di dema avakirina Federasyonê de hin gelş derketin or-tê Ew gelşen wê rojê kêm yan ji zêde iro ji hin doz dikan. U wek tê zanin di kongra 5'an de bi rojan li ser van gelşan hate axaftin. lê bêi ku ji binde bêne hêl kirin. Loma ji birjara vê kongra ıstisnai hate girtin. Lê em hêvi dikin ku emê bikaribin di vê kongrê de hin gelşen xwe na hel bikin. û ya din ji, ew problemen ku ne yêñ Federasyonê ne, neynin vêderê û cardin bi rojan li ser munaqše nekin. Em hêvi dikin ku munaqşen me li ser kar û bar be, li ser kêmasi û çewtiyên me be û ji bo Federasyonek hin xurttir be

Nuha em werin ser xebata me ya heta iro.

Kongra me ya 5'an di dawiya meha çileyê paşin de çê bû bû. Vatini parkirina me hinek wext girt. sebebê wê ji ev bû ku li ser hin vatiniyan ne dihat li hev kirin. Lê belê piştî çend civinan, di 13'ê meha sibatê de me Komita Karger vatini di nav xwe de par kir.

\* Piştî vê civîna me bi 3 rojan, civînek mezin bi navê Konferansa Stockholmê hate çêkirin. Em wek Federasyonê nehabîbin ezimandin. Lê belê em sê heval (serok, sekreter, kassor) wek guhdara di vê konferensê de hazir bûn. Roja piştî konferansê, yanı di 18'ê sibatê de Komita Karger civîya û birjar girt ku li ser vê konferansê vbelavokekê bi sê zimana; Tirkî, Kurdi, Swêdi belav bike. Belavok piştî du rojan hate hazir kirin. Lê belav kirina wê geleki wext girt. Ji ber ku di nav komitê de du heval li dij derdiketin. Ji bona ikna kirina van hevalan me çar civîn çêkir, lê heval iqna nebûn û di dawiyê de li gor pirraniyan dengan ew belavok hate qebûkirin.

\* Di Kongra Federasyonê de bîyar hatibû girtin ku em ji Hukûmetê re ji parlementoya re, ji Oswald Soderquist re tel-grafan binin û ji wan daxwaz bikin ku ew mudaxeleya Tirkîyê ya zarokxana Kurdan protesto bikin û piştigiriya xwe bi gelê kurd re nişan bidin. U ji şefê Sosyal buroya Tensta Ove Radberger re ji ji bo beyana wî si-pasnamekê bişne û ji bo piştigiriya wî jê re sipas bike. Biryara Kongrê ya din ji ev bu ku em, li ser vî buyeri belavokekê

li gel belav bikin. Me van bîrya-reñ kongrê bê kêmasi hemû bi cih ani.

\* Me di 6'ê Adarê de bi SIV re li Norrkoping civînek çêkir. Komita Karger bi hemû endamên xwe ve di vê civînê de besdar bûn. Piştî civînê û informasyona ku me da wan berpirsiyareñ SIV diyar kirin ku ew ji vê ziyareta me gelek razi man.

\* Di 17'ê meha Adarê de li Stockholmê meşek li diji njad-perestiyê hate çêkirin, em ji wek Federasyonê tevi vê meşê bûn. Di vî meşê de bêi komelekê hemû komelên endam di bin bandrola Federasyonê de meşyan.

\* Me di 23'ê Adarê de li Stockholmê li Asogymnasium Newroz bi hawaki girseyi piroz kir. Şeva Newrozê gelek baş derbas bû. Di şevê de li dora 1200 kesi besdar bûn. û bêi viya ji gelek kes, ji ber ku ci nema paş de vegeriyan. Cardin me beri Newrozê afişek derxist û di şeva Newrozê de ji belavok bi Kurdi belav kir. Bêi komelekê, hemû komelên endam di şeva Nwrozê de besdar bûn.

\* Em ji Federasyonê sê kes (serok, berpirsiyare malî û sorkê komîta çavder) di kursa ekonomi ya ku ji ali SIV de hati bû hazirkirin besdar bûn. Di kursê de informasyona bingehin li ser aboriya komelan hate dayin. Wek, defterê malî çawa tê girtin, çawa pêşkêşî kongrê dibe û ji bona alikariya xebatê û alikariya kovarê kijan tişt hene ku mirov mecbûre ku bi cih bine. Ü.h.w. Kurs li Stockholmê li Hotell Karelia du rojan ajot.

# NAMÊN XWENDEVANAN

Hemû hevalên Redaksiyona  
BERBANG'ê ra !

Hevalên hêja, ew du hejma-  
rên Berbangê ku we ji min ra  
şandibû, min stand. Jî bo rêki-  
rina Berbangê, ez bî dil û can ji  
we hemûyan ra spas dikim û  
silavên xwe yên birati, kurda-  
yeti û şoreşvani bî rêdikim.

Ez tevi vê nama xwe ji Ber-  
bangê ra helbestek xwe dişin-  
nim. Eger wun layiq bibinin û  
vê helbesta min dî Berbangê da  
bîweşinîn, wê vi helbesta bîbe  
serxweşî û silavnameyek ji bo  
malbata Seydayê Cigerxwin.  
Seydayê nemir dî dilê me û  
hemû kurdan da diji û tucar  
bir nabe.

Ez bî dil û can ji we hemûyan  
ra carek dîn silavên xwe yên bir-  
ati rê dikim, Newroza we ya  
1985 an pirozdikim û serfirazi-  
ya we dixwazim.

Rizê Gur  
Riza Çolpan

PEY MIRINA MAMOSTA  
CİGERXİN'ra

"Ronahi lî pey tari ye  
tim roje lî pey sev".  
Va gotina yê te ye, SEYDA  
Xewa kûrda tu rakev.

Tu namiri dilanda  
Diji, diji şev û roj  
Te milyon fidan danin  
kurdistan.de bûne al.

Şev û roj mezin dibin  
Jî bo ku te ew av dan  
Dilê te qe nemine  
Dibin mina te şervan.

Mîrina te mamoto  
Em şewtandin, helandin  
Gere lî ser tirba te  
Tipen zêr bin nivisandin.

Carek dîn disa bêjim  
Tu bir nabi tu caran  
Çav şîl û dîlbirine  
Jî bo te RİZÊ GURAN.

Heval û hogirê doza me yên  
giran!

Bî silavên germin em vê na-  
mî ji we ra rê dikim û hêvidarîn  
ku wê name bigihije we û wun  
di demeke xweş da dijin û kar û  
barênen xwe yên perweri bî cih ti-  
nin.

Beri çendeki me (Xortêñ  
kurd lî bajarê Volgoradê - Sta-  
lingrad- Yekitiya Sovyet) ji  
Enstituya Kurdi lî Parisê çend  
pirtûk, kovar, kaset, rojname û  
wêne girtin û em bî vê yekê pir  
şabûn. Jî xêni vana, me du hej-  
marênen Berbangê ji girt. Lî baja-  
rê Stalingradê nêziki 25 xortêñ  
kurd ji Kurdistana Rojava (Sû-  
ri) û Kurdistana Başûr (Iraq)  
hene û me pir dixwest, ku wun  
ji me ra şandina Berbangê dom  
bikin.

Em hêvidarîn, ku wunê vê  
yekê bî cih binin û serê me ji  
ber va bilinde.

Bî silavên şoreşvani

Xortêñ Kurd  
lî Bajarê Volgogradê  
BAVÊ GULİSTAN

bona wan M.Emin Bozarslan Mem û Zina Ahmedê Xani û per tûka xwe "Elifbayê Kurdi" çap kırine. Eva kara karê méraniyê û camêriyê, xêrxweziyê, wela teviniyê û netewe eviniyê bû, lî welat lî nav agrî û alavêda her kes cile't nake vi şu xli bide ser xwe, bîqedine, M.Emin Bozarslan eva kara da ser xwe bi dil û can ani seri, dûlê heval, hogurên xwe, rewşenbir û zanyarêñ kurd şâ kîr, kîfa wan xweş kîr. Jî zanyarêñ kurd yêñ ji Kurdistânê der yek ji ezim, ewi bi çapkırına van herdu kîtêban ez du caran lî ser hev şâ û kêfxweş kîrim. Min hingê got : "Ay mero, camero, eferim ji xireta tera, tu berxudar û serfiraz bi di iş û karê xweda." Lî paşı çapkırına van herdu kîtêban gelek sal derbas bûn. M.Emin Bozarslan mecbûrbû welatê xwe bîhêle, ji nav destê cenderme goveka tîrkîn xûnxur derkeve, here wela tê Evropayê. Niha lî Swêdê -welatê bêteref- mîvanhîzda dijî, destê xwe ji iş û karê xwe ne kışandîye, mina berê kîtêb û pertokan dînivise, çap dûke û dûlê hevwelatêñ xwe, rewşenbi rîñ kurd û zanyarêñ kurd şâ dike. Lî nav van salanda ewi disa ez du caran şâ kîrim. İcar cara pêşin ewi bi çapkırına pertokêñ çirokêñ kurdî û pertokêñ bo bîçûkan ez şâ û kêfxweş kîrim. Eva kara kareki gelek muhi me bo perewerde kîrin, telim û terbiyet kîrina bîçûkêñ kurdan, her bi cameri û bi layqi deradar û mamostayê zimanê daykê qedir û qîmetê van pertokan dîzannîn û wê rojekê razibûna xwe ji nîviskarê wanra binivisim. Lî vîra her çend ez bi xwe ziman zan û filologim, ez bi nîvisar bi dil û can ji M.Emin Bozarslanra şikîdariya xwe dînivisim û jêra dîxwazîm silameti, cansaxi û ser-

fînyazi di iş û karê wê xêdarda.

Lî nav van rojanda heval û hevkarê têkoşer û xiretkêş M. Emin Bozarslan berheviya xebata ya çapkırına kovara "Jiyinê" ji minra şandiye. Eva bû caraçaran, ku ewê ez dîlşa û kefxweş kîrim. Dî riya destxîstin, lêgerin, vekolin û çapkırına vê kovarêda ewi gelek asegeh dane rakîrinê, rê û berga xwe fire kîrine, ku kovara "Jin" vejine. Derheqa wê xebatêda ewi li celdê "Jiyinê" yê pêşin da nîvisiye û bo xatîrê çi ewi ev kovar vejiyandyie. Bî fikra min gelek kariki bi hêja, giranbiha û lazim ewi camêri kîriye, hemû gîranî û asgeh dane aliki, ew kovar ragihandiye ber destê xwendkar û xwendevanêñ kurd, hemu kesen zimanzan, tarixnas, edebyat nas û folkloristê kurd û kesen kurdnas bi reheti, hêsanî dikarin wê xebatê bixunîn, faydê û sûdmendiyê jê wergîrin. Têda gelek pîrsên tarixi, çandi, yêñ peydabûn, teşkilbûna kovara "Jiyinê", pîrsên komeleyêñ kurdi, jêñ xebatkarêñ wê, pîrsên rewşa neteweyê kurd li destpêka sedsaliya XX da hatine lêgerin û vekolinê. Dî vê xebatêda M.Emin Bozarslan mijûli van pîrsên jêrin büye: 1. Haydariya giştî di heqê kovara "Jin" da (rûyê 7-14), II. İdiolojiya kovara "Jin" (r. 16-22), III. Bergehêñ "Jinê" (r. 24-43), IV. Ronikirîna büyeren mîjin (r. 44-50), V. Büyeren rojin û cîvaki (r. 62-65), VI. Xebata deyi û bêjeyi (r. 67-76), VII. Çiroka vejandîna kovara "Jinê" (r. 82-84), VIII. Nasandîna çapa nû (r. 86-88).

Jî rûyê 95 heta 177 ev derece bi zimanê tîrki hatine çapkırinê. Lî nav rûyêñ 185-320 da M.E-

min Bozarslan wergerîna penc hêjmarêñ kovara "Jinê" çapkîrine, ewi madeyêñ kurdî yêñ erebi çapkiri wergerandiye ser latinîya kurdî. Madeyêñ tîrki ji wergerandiye ser latinîya tîrki. Bî vi cureyi hevalê meyi xoşevist zehmetekî gelek giran kîriye, kovara "Jiyinê" ji xwendevan û xwendekarêñ xwera diye, kilita xwendîna wê dayê destê wan, hemû çar mikanêñ fayde jê hildanê ji tarixnas, edebyetnas, folklorist û zimanzanêñ kurdnasra xuliqandîye, usa kîriye, ku ew karîbin materiyalê pêşê û seneta xwe jê hilçînin, nîvisarêñ zanyari lî ser ziman, tarix, edebyet û folklora kurdî binivisin.

Em hividarîn û bî dil û can dîxwezin, ku hevalê meyi dilsoz û tekoşer lî nav van salanda hêjma rîn mayi yêñ kovara "Jinê" bi xêr û silamet wergerîne û bî kurtaberi li babet wanda bir û bawar û ramana xwe lî ser wan binivise û paşê dest pê bike lî ser rojnama "Kurdistanê" (1898) bixebite, mina kovara "Jinê" wê vejine, nîvisar û miqâlîn wê yek bî yek ji nîvisandîna erebi wergerîne ser nîvisara kurdî niha, yek bî yek wan ji hev derine, bîşkîvine, verîsine, qedir û qîmetê wê safi bike, rabîghîne xwendevan, xwendekar û zanyarêñ kurd, dûlê wan şad bike. Ez nîzanîm, ezê heta wê rojê hebim, bininim, lî ser xwe bîm, karibim wê bixunîm, lê ez zanîm, ku M.Emin Bozarslan zana û hozeneki mezîne, pispo reki çeye, şarezaye û pirzanaye di iş û karê xweda, Ewê wi kari bi serbesti bîqedine, miyaser bike, bîngâ lêgerîna tarixa destpêkirîna çapkırına kovar û rojnamayêñ kurdî ji paşketi û paşrevêñ xwera dayine.

### DERWÊŞ EBDULLE

—Bo fırışteyi müsiqa—

Be rengi zerd û şêweyi dest û şîşîali kîza, Derwêş  
Hezîm kîrd besteyek bibiyêm seraser huzn û matem  
Le simata bedim kîrd heykeli umreki hesretkêş,  
Weha diyare ke bextit aşîyanî bulbuli xem bê!..

Belê diyare, le naw qewmi besita qedri sin'etkar  
Wekû eksi qemer waye le naw hewzêki lêxin da,  
Belam texti rûfah û tacî hurmet mîletê huşyar  
Be ustâdê eda wek tu le naw şîşîali kunkun da.

Seher bînîte gîryan û qîsa, sehri peri nexme!..  
Birayı Derwêş! Ezanîm bo maişet vêl û awareyi,  
Be zehri nailacite le nakes wistini luqme,  
Be mîrdîntê ke guyi naşî exînkînê xiroşî ney!



Belam çî bikeyn le naw çawi reşî ba'zê zekayî gewre  
Wekû tawi guli dem - ba le ser berdêki req eruwên,  
Eger xîlqet nesibi umri toyî mehkûmi em dewre  
Nekîrdaye, xuwa alîm, le kam erşit esû dawê!..

Ne herfi mektebêkit xuwend, ne ustâdê peli girtî,  
Sîrf berzi zeka em sin'eteyi fîr kîrd be şîşîalîd,  
Hemû weznêki gorani, le tûlani heta kurtî,  
Be ser penceyî huner kîrdit be dîli koşeşî zalîd!..

Ewendem bist le müsiqa xiroşî rohi bêgana  
Mizaci kurdewarîm têkçûwe, Derwêş Ebdulle,  
Dexîlit bîm desa bew lawuk û ay-ay û heyranê

Şepoli zewqi mîlli pir derûni mat û çolîm ke!  
Le Bithovîn gelê ziyatîr be rohîm aşnayî, welle  
De, ey Derwêş, sîkalayek le gel rohi klolîm ke!..

GORAN



HUNERMENDÊ HUNREWA-  
YÊN Wİ YÊN WINDABÜYİ Ü  
EDEBİYATA NEMIRI

# DERWËŞ EBDULLE

Jî kovara Al-Thakafa Al-Jadida  
hejmara 20-Gulan 1980  
Werger: COTYAR

Jî ditina yekemindiyar bû, ku zilameki ji heftê sali buhuriye. Rûyê wi sîpi, brûyên gur ku çavên wi yên kesk wînda dikir. Diyar bû ku hêjar bû, kiraseki kevin û şalwareki kurdi yê dîriyayı li ber û kileşeki pinekiri li pê bû û li ser şalwarê xwe qayışeki çerm gîrêdabû...

Hêdi...hêdi diçû û sêniyeki helawê li ser milê wi bû. Bang û hawar dikir "Helawa belaş! Helawa belaş...!" Ev muzikvanê bî nav û deng, bilûrvanê Semşîlê DERWËŞ EBDULLE bû. Derwëş Ebdulle li bajare Bo-kan li Kurdistanê Rojhîlat (Kurdistanê Iran) ji dayika xwe bûye. Paşı derbasi Kurdistanâ roj-ava (Kurdistanâ Iraq) bûye. Ew-çax destpêka vê sedsalê bû. Derwëş Abdulle xort bû. Wi pênci salê dawiya jiyanâ xwe, bî ger-vaniyê li gund û bajaren Kurdistanê û bî guhdari û jiberkirina melodi û mıqamên folkloriyêñ kurdi, bî hemû şûvan va derbas kîr. Gelek karan kuriye. Wek gavan, cotyar, karker û carek dîn gavan, cotyar... û her wîsa hatîye li ser helawfirotinê ravesti-yaye heta mirina xwe.

Derwëş Abdulle, zanatûre muzikvanê Şemşîlê bû. Lê tu rojê bî bira xwe ne anî, ku bi zanina xwe ya muzikê bijit, yan hunera xwe bifroşit. Bi tenê bê cih, bê jin û mal, bi xîsm û xerib bû. Hevalê wi yê bî tenê ku kîfa wi pê dihat, Şemşîl melodiyêñ wi bûn. Ew bûn hemû daxwaz, bir û baweriyêñ xewnenwi.

Hewar dikir, bî dengeki bîllind "Helawa belaş! Helawa belaş..." "Şemşîl bî du filsê...". Derwëş Abdulle hezdikir, ku bi banga xwe bî kîmani yek guhdar -zarok yan mezîn- bibine ji bo hunerên xwe. Wextê yeki gazi wi dikir, dihat, darek û parçen qumaşê kevn li ser, datani erdê wek kursiki û bî kîf şemşîlê ji ber qeyîşa xwe dikşand û dest bî "pêşkêşkirina helawê" dikir. Paşê çavê xwe dîniqitand û cegerên xwe tiji hewa dikir û nefes ji dîfinê dikşiya heta muzik radiwestiya. Dûlopêñ xwêdanê ji aniya wi diketîne ser rûyet wi û dî ser şemşîla wi ra dikşîyan û diketîne xwarê.

Derwëş Abdulle, wek bî nav û dengtîrin muzikerê Şemşîlê;

melodiyêñ kurdi yên gorani, kurmanci, sorani û bahdinani dî-hate naskîrn. Jî hemû heremêñ Kurdistanê gelek heyran, lawik, ay-ay... mıqamên gavana dizanibû.

Rojek ji rojêñ bîharê, dema nivro bû, lî bajare Sulêmaniyê lî Kurdistanâ Iraq, miroveki gelek bî rûmet bang lê kîr: "Mam Derwëş... Bîde min sê parçen helawê."

Derwëş Ebdulle bî dileki xweş û bî kena qebûlkirinê le nihêri... Herwek ku dizanibû çi dî dile vi mirovê baş da heye. Derwëş Ebdulle sê mıqam lêdan. Ev mirov helbestvanê kurdi yê nemir Ebdulle Goran bû.

Melodiyêñ Derwëş, tesir li ser GORAN kîr, ku ew melodi bûne çirokeki helbestvani bî na-vê "Munecaet Lî Gel Derwëş Ebdülle".

Derwëş Ebdulle mir û hemû hunerên xwe li gel xwe bire qebrê. Qet dokument ji hune-rêñ wi yên muzikê neman bo folklorâ kurdi. Tenê çiroke-ki helbestvanî ji şairê Kurd Goran ra maye.

# SERHILDANA SÊX SEÎD

## WÊ DI DILÊ ME DA TIM BIJİ



Gelê kurd 60 salên dijwar, salên bî xwin, bî teda û êşkencyan û bî serhildanan derbas kîr. Ew ji bo mafê'n xwe yênetewi û demoqratik ticar koletiya dijmîn qebûl nekir. Berya serhildana Şêx Seid çawa gelê kurd gelek cara seri hilda, piştî Şêx Seid ji, ji Kurdistanê serhildan kêm nebûn. Diroka Kurdistanê ji ali serhildanan va gelek dewlemende û serhildana Şêx Seid di diroka Kurdistanê da ciheki giring digre.

Bê şık, di vi nivisa kurt da mirov nîkare serhilda na Şêx Seid şroveke. Lê, bî kurtayî be ji, em dikarin agahdariyek pêk binin û biranina vê tevgerê di nava çend gotinan da bî cih bikin.

Wek ku tê zanin, di şerê cihanê ya yekem da dewleta Osmani bê taqet mabû û bî peymana Sykes Picot'ê (1916) Türkiye di nav imperialistanda hate parvekîrin. Di sala 1918'an da İngilizan Kurdistan'a Iraqlê, Fransızan ji Kurdistan'a Sûriyê zift kîr û Kurdistan bû çar perçê. Kurdistan hate ta lankîrin, rewşa gelê kurd gelek xirab bû û hate şe landîm. Disa di vi demî da, sala 1917 an da Şoreşa Oktobrê teqiyâ û gelên Rûsyâ'yê ji bin nîrê çar rizgar bû. Dengê şoreşa Oktobrê li hemû dinê belav bû û ji gelên bindest ra ronahiyeck peyda kîr.

Dı sala 1920 an da di navbera Osmaniyan û dewletênu ku Tirkîyê zift kîrbûn, peymana Sewr hate pê kanin. Dı vê peymanê da li ser navê kurdan Şerif Paşa besdar bûbû û li gor peymanê gere Kurdistanek otomônom saz bûya. Kemal Ataturk ji, di şerê diji imperialistana da, li alikariya kurdan digeriya. Jî bo kurdan bikşine aliyê xwe gelek soz û bext da. Bî vi awayi kurd ji tevi vi seri bûn û alikariya tikan kîrin. Piştî ku Tirkîye hate rizgarkîrin, di demek kurt da peymana Lozanê (1923) hate çêkîrin. Dı vê peymanê da, ew şerfîn peymana Sewrê hate avêtin û li ser mesela gelê kurd rabezrin çê nebû. Peymana Lozan'ê gelê kurd gelek ne rehet kîr, lê gelek serokeşir axa, mir û begêن xayîn ji Ataturk ra telgraf şandin û wi piroz dikirin!

Dı sala 1924'an da bî hînek reformen şikli terorîk mezîn bî ser gelê kurd da hate ajotin. Bî zagonênen şoveni, mafê'n gelê kurd yênetewi û demoqratik hate qedexekîrin... Van buyeran Şêx Seid û welatperweren kurd gelek ne rehet kîr. Di nava demeki kurt da, xebata Şêx Seid û hevalbendêni wi li Kurdistanê şax da. Cara yekem li Darahêne sala 7.2.1925 an da şer destpê kîr. Ü serhildan ji bo mafê netewi û demoqratik bû. Jî ber vê yekê ji, di

demeki kurt da ev tevger xurt bû. Diyarbekir, Bin-gol (Çebaqcûr), Xarpê t (Eleziz) û heta dora Mûşê hate rizgarkırın. Lê mixabin, ev tevger negîhişte hemû hêlên Kurdistanê û tevger bî tenê ma. Jî aliki va leşkerên tirk bî tanq û top û bî çekêن teknik êriş dikir, jî aliyê din serokeşir, axa û mirên kurd yê n xwefiroş peyatiya kolonyalistan dikir, imperyalistan jî bî her hawê aqlmend û hevalbendê dewleta şovenist bû. Gelek hêzên tirk yênu ku ji xwe ra digotin pêşverû, serhildana Şêx Seid listikek imperialistan dititin û li rex dewleta xwinrij cihê xwe digirtin....Bî vi hawê çarmedorê serhilda

nê hatibû girtin û dan û standina tevgerê ji dinê hatibû birin. Ü di sala 27.4.1925'an da serhildan hate hilweşandın. Şêx Seid bî antaxi û bêbextiya Qasimê Cibrani hate girtin.

Piştî sêdarvekirina Şêx Seid û hevalêni wi, kurd bi mîrxasi heta sala 1928'an ji şer kîrin û teslimê dijmîn nebûn. Jî ew roj bî vir da, gelê kurd gelek carêni din seri hilda û iro ji li du beşen Kurdistanê şer dike. Me Şêx Seid, hevalêni wi û hemû şehidêni Kurdistanê jî bir nekiriye û diroka Kurdistanê bi tekoşerêni wek Şêx Seid serfiraze.

# agahdari li ser civinê federasyonê

## CIVINA BI ABF'RE

Dî 28'ê meha Adarê de Serok û berpîşyârê malî yê Federasyonê bî berpîşyârê ABF yê here-ma Stockholmê re civinek li ser jîyan û meşandina komelan pêk anin. Dî civinê de berpîşyarek ji SIV ji besdar bû.

Dî civinê de nûnerên Federasyonê ji berpîşyârê ABF daxwaz kîrin, ku qursekê ji komelênden damênden Federasyonê re çê bikin Armanca çêkîrima vê qursê, komele çawa idare dibin, protokolênden civinan çawan têngirtin û dî vi wari de çi berpîşyari dîke-ve ser kijan endamên komita karker û hwd. Piştî axaftinêndû û dûrêj, bîryar hate girtin ku ABF li Stockholmê qursekê pêk bine û wê ji her komelekê du kes dî vi qursê de besdar bîbin. Ours, wê du rojan bajo û mesrefen materiyalan ji wê ji ali ABF de bê kîrin. Ev yek wê bî komelan re bê axaftin û dî dû re ji roj, cih û saet bê diyar kîrin.

Bî vê daxwaza me berpîşyârê ABF û nûnerê SIV gelek kîf-xwes bûn û gotin ku dî vi wari de em hazırın ku hemû alikariyê bî we re bikin.

## CIVINA BI SIV'RE

SIV (Statens Invandrarverk) dî 26 û 27 ê meha Adarê de li Hotell Karelia konferanseki li ser aboriyê pêk ani. Li gel hin organizasyonen din, Federasyona me ji bî sê (3) nûneran ve dî vê konferansê de besdar bû. Armanca konferansê, agahdariyêni li ser aboriya komelan bû. Karêñ abori çawa dîmeşe, defter çawa tê girtin û netica van kar-an çawan pêşkêşî endam û kongrê dibe? Dî vi wari de her komel pêwiste ku kijan belgeyan ji SIV re bisine.

Konferans du rojan dom kîr. Dî konferansê de ji SIV 6 kes besdar bûn. Her yek li ser hin meselan mijûl bûn û informasyon dan. Dî van her du rojan de

li ser gelek gelşen rêxistinâni û aboriyêni wan hate sekînandin. Dî vi beşi de nûneren rêxistinâni û hevalêni me yek bî yek qala gelş û dijwariyêni xwe yê abori kîrin; pêşniy ar û daxwazên xwe pêşkêşî berpîşyârên SIV'ê kîrin.


Dî konferansê de li ser kovaren ku rêxistin derdixin ji bî dûr û dîrêjai hate axaftin. Dî vi beşi de informasyonen tekniki û yê abori hate dayin. Wek, jî bo derxistina kovarekê ji ali tek niki de çi dîvê û ji bo ku karibe alikariya maddi bigre dîvê kijan şertan bî cih bine.

Konferans, him ji ali dan û stendin û naskirina bî rêxistinêni din re û him ji ji ali informasyonen ku pêwist bûn gelek baş bû. Bî vê konferansê me kîys di ku ditin û pêşneyarên Federasyona xwe pêşkêşî SIV bikin û yê rêxistinêni din ji ji nêz ve guhdari bikin.

**AGAHDARIYEK SE GUHURANDINA  
TELAFONA INVANDRARVERKET**  
Numara Telefona Nû : 00 / 15 60 00

dı şerê cihanê  
yê duwemin da

# mêrxaseki Kurd



Çawa tê zanin iro li hemû cihanê 40 saliya serketina hêzên pêşverû li diji Hitlervanêna faşist tê piroz kîrin. Dı vi şerê cihanê yi duwemin da 50 milyon mîrov hate kuştin. Bi hezaran cih, wek dibistan, nexwaşxane, mal, xani, cihêna kar hatin xerab kîrin. Bi hezaran kes seqet man.

Dı vi şerê mezin da, bî taybeti gelên Sovyet mérxaşike mezin nişan dan û faşist ji welatê xwe girtin avitin. Bi vi tehri hemû cihan ji xedara faşizmê xelas bû. Dı nav gelên Sovyet da, wusan ji leşkerên Kurd cih girtin û şer kîrin. Lî jêr em serpêhatike şervaneki Kurd pêşkêşi xwendevanêna xwe dîkin.

BERBANG

Rûniştvanê gundê Çamuşliyê (nehiya Arasê) Mecidê Keleş tevê şerê bona Xarkovê, Dinenpodzercinskê, Dobmasê Tulayê û Stalingradê bûye. Diyare weki şerê bona Stalingradê navâ serketina Şerê Welêt yê Mezin da ciki taybeti digre. Hitler gumanâ xwe danibû, ser wê yekê, weki Stalingradê hilde, pêşeniyê pire-pireke, bakuра welêt zevt bike û ji aliyê çemê Volgayê da êrişti ser Moskovayê bike. Leşkerên Sovyetê wi şeri da bî mérxaşî berxweda û serketin. Pey vê yekê

ra Ordiya Sovyetê çar ali êriş kîr. Dest bî firehi raqetandina leşkerên faşista bû ji erdê Sovyetê.

Tevgelêni wi şerê giran, Mecidê Keleş, bona wi şeri da awa gili dike:

"Meha 8'tan sala 1942'an em ji Xarkovê hatin, weki alikariyê bîdin leşkerên me, ku Stalingradê da şer dikîrin. Dijmin gëlek xurt bû. Me bereberê tebiyê xwe qewin kîrin. Taburêni me yêni wusan hebûn ku her yekê da 40-50 leşker mabûn. Wi çaxi qu mandariyê deshtur da, ku em çiqas dîkarin ber

xwe bîdin, hetani komekdariyê didine me.

Heta mena 9'an em xurt sekînin. Wi çaxi leşkerên peyayê berê hatine hewara me. Edi me zanibû weki hêzên me zor bûne. Gazi me, serbazan kîrin, gotin weki roja nozde meha 9'-an da êriş bikin. Hema wê rojê, sibê berbangê seeta 6'an me êrişkir.

Ez dı wi şeri da xedâr bîrindar bûm. Ez birime nexwaşxana Saratovê û rojekê min ji serekê alaya me kaxizek stend. Ewi çavronahî dîda min, ku

Stalingrad aza kırine û bîryar girtine bona nişana "Steyrka Sor" va mîn rewakîn. Şabûna mîn bê hed û hesab bû. Ne a-xir leşkerên me dî wi şeri da serketine, lî ku mîn ji şerkirîye, xuna xwe rêtîye.

Bona mîrani û egitiya xwe, ew gelek nişanan va hatiye re-wakîrînê. Pey şer ra heta roja irojin nişan, hurmetname û pêşkêşa distine. Çend roja pêşta nişana "50 Sal Nava Cergêن Partiya Komünistên Yekitiya Sovyet" dane wi. Derheqa Mêrxasiya wi da pirtûka zaneyê Kurd Xalît Çeteov bî sernîvisara "Tevge-

liya Kurdêن Sovyetê Nâva Şe-re Welat Yê Mezin da" hatiye nîvisarê.

Serhatiya jiyina Mecidê Kê-leş dewlemende. Ew nîha 74 saliye. Eva weke 60 salane ku dixebîte, weke 15 sala bûye serokê kolxozen Elegezê, Çamuşluyê bûye lênenîrvanê komnehiya, lî Sovyet gund wi wusan ji bî xurti şer kiriye lî diji xiraban û casusan. Beri şer lî bajarê Leninakanê, ew kur-sen serbaziyê hin bûye û bî rutba serbaziyê çûye ber şer. Jî dewletê ew nîha mafê kal-bûnê distine, heta roja iroyin ji dixebîte, teknikê mal-

hebûna néhiya Aparanê yê avêye.

Yorisê kurê wi Ordîya Sov-yetê da kar dike, mina bavê, deynê xwe ber welêt bî rûspiti dîqedine. Miraz xwendekarê Instutîya Erevanê ya Pedagogiyê ser navê X.Abovyan. Ser hevdu 52 nevi û neviçirkêni wi hene. gava neviçirkêni wi lî dorê berev dibin, carina der-heqa wan salêن gîran da gili dike, rojê gîran yêñ bî zehmet derbazbûyi bir tine.

## reva diya mîn

Diya mîn,  
diya

du xûşk û sê birê mîn.

Dî çarde saliya xwe da hatiye  
revandinê,  
dî banzde saliya xwe da bûye  
jîna mala.

Diya mîn,  
wê salê ji, gîran bûye  
çok daniye erdê  
û cara pêşin ez hatime dinê  
bûme bîçûkê malê  
bîçûkê malê  
hezkîriyê malê.

Ne bî darê zorê  
bî dîlê xwe reviye  
hîzkîriyê  
hîzkîriyê tenê diya mîn.  
Bîriye-anîye gede lawkê xwe  
dî dîlê xwe da  
diya mîn tenê ya xwe kiriye

û qutiya dîlê xwe  
şevekê ji bavê minra  
vekiriye.

Xew neketiye çavê diya mîn wê şevê  
kela dîlê wê avitiye bedena wê  
sor bûye  
hûr bûye  
û gîran bûye.

Kela dîla, huba dîla  
qe xîlas nebiye wê şevê  
gîrtiyê-vekiriye çavêñ xwe heta sibê.

Ev keçka  
çavêñ xwe vekiriye teze lî dinê  
dî çarde saliya xwe da  
ji aliyê bavê mîn da  
tê revandinê.  
Bavê mîn  
dengbêjê pêlêñ behra dîlê  
dîlê diya mîn  
Û diya mîn  
çavêşiyâ bavê mîn.

Dagens Nyheter 25-5-1985

# SAVCIYEK KURD LI SER KURDA DIAXIFE!..

Dı 21.5.1985'an da sawciyeki kurd hate Swēd û ji hukūmeta Swēd daxwaziya heqē rūniştandına siyasi kır. Ev cara yekeme ku sawciyeki kurd tē Swēd. Bı hatına vi kurdē welatparêz, gelek zordari û êşkenceyên ku dı mehkeman û girtigehan da li ser gelê kurd tē ajotin,aşkera bû.

Sawciyê kurd di sala 1970 da li bajarê Stenbolê Fakulta Huqî qê qedandiye. Jı ber ku ew kurd û miroveki politik bûye, 2 sal karek nedanê. Paşı, bı alikariya hinek nas û dosten xwe yê brokratik, li Kurdistanê dest bi karê sawcitiyê kiriye.Dı vi kari da li gelek ciya hatiye gerandin û ji ber ku dı mehkeman da alikariya kurdan kiriye, tim dı bin çavan da bûye.Demek ji kar hati ye dûrkirin û salek ji di girtigehê da maye.Ev kurdê welatperwer niha li Swēd'e .

Sawciyê kurd, li ser rewşa gelê kurd û serpêhatiya xwe bı Dagens Nyheter'ê ra heypevvinek çêkir.Dı şirovekirina sawciyê kurd da, cunta faşist tê rûreşkirin û li ser rewşa gelê kurd tê sekinandın. Sawciyê kurd, li 25.

5.1985 da li Dagens Nyheter da weha dibêje:

- Şandina multeciyên kurd ji Swēd xetereki mezine,lewra jina wan dikeve talukeyek mezin. Min bixwe ji dı vi wari da gelek ceza li kurda bîriye.Hukûmeta tîr dibêje, ku kurdêن ji welatêن Ewrûpayê bêne zivirandin em bi wan tiştek nakın." Lî ew derewên mezin dîkin! Lewra, yêñ ku paşa têñ zivirandin yan têne girtin, yan têne wundakirin, yan ji têne kuştin.Ku ez wek sawciyek ji kuştin û na gelek kurdan ra şahid bûme. Eger kurdeki ber bı Tîrkiyê bê zivirandin,ew kurd wê xwe li mehkemeyê cuntayê da bibine Dı Tîrkiyê da mirov nikare bîbêje ez kurdım, lewra evya sûce ki girane. Lî gor hukûmetên Tîr, eger miroveki kurdiyya xwe bîbêje, ew xayîne,kurdayeti dike û li parevekirina Tîrkiyê digere!!! Ewçax ji mirovên wusa ra di navbeyna 5 û 8 salan ceza tê birin....

Sawciyê kurd, di şirovekirina xwe da, li ser rewşa Kurdistanê û tişten ku wi dı mehkeman di

Aserbajdsjan'da idlibiye!

## Många kurder dödas

Av INGEMAR LÖFGREN

— Kurderna kan inte  
sickas tillbaka till Tur-  
kiet utan fara för sina liv.  
Jag vet, jag har själv dömt  
många av dem till långt  
fängelsestraff.

Den som säger detta är  
turkisk åklagare. Nu har  
han sökt politisk asyl i  
Sverige eftersom han själv  
är kurd.

Han kom till Arlanda på falskt  
pass för två dagar sedan. Vi kan  
kalla honom B. Officellt bor han  
på flygningshotellet Stella i Ma-  
ta utanför Stockholm. Men eftersom  
han är radd för represaliator  
bor han hos vänner

Peter försäkrade gängen en turkisk  
åklagare soiker asyl i Sverige

— Den turkiska regeringen  
ljuger offentligt när den säger att  
inget sätta handen de kurder som  
kommer tillbaka, såsom han till  
Dagens Nyheter. I själv varit  
kastas de i fängelse, fors, inner  
eller döds. Som åklagare vid jug  
var många av kurderna lagt ut  
fängelsestraff.

— En kurd som skickas tillbaka  
till Turkiet hamnar i dömtsät  
Om han säger att han är kurd,  
vilket han måste eftersom det är  
just det för han sökte asyl i ett  
annat land, så säger den turkiske  
åklagaren att han kamper mot  
den turkiska statens enhet, att  
han vill döda Turkiet. Därför tar  
han nio års leva och åtta års  
fängelsestraff.

— Om däremot en turk soker

att han inte skickas till jobb, för  
att han hjälper kurder

B tvungdes flytta till Arlanda  
och Men da, följdje svartas visa,  
med korta upphöjda av slötslöshet  
och då enhet sin egen. Lovat-  
tate arb. tids politiskt

Slutligen gick han till de tur-  
kiska flygvapnet och valde att ålä-  
gar sig i en militärdräkt i Ankara.


— I Ankara har de kontroll på  
ellj och alla. Därför kunde de re-  
ceptera mig även om jag var  
kurd.

B fortsatte att hävda kurdiska  
soldater : det turkiska försvaret  
och hanande darför till slut i  
fängelse ett år. Under tiden stan-  
tades nio processer mot honom  
för han, tidigare verksamhet  
När han tillslut slappes passa-  
de han med att följa till Kurdistan

ye, weha dom dîke:

- Kurdistan welateki mêtigehe  
û ji sed salan vir da li ser gelê  
kurd zordariyek nediti tê ajo-  
tin. Ü iro ji ji bo gelê kurdjiyan  
bûye wek zindan...Dı mehke-  
man da gelek cara ji bo kurdan  
tercumana dihate bî karanin.  
Wextê ku ifadê wan dihate ver-  
gerandin, gelek cara xelediyê  
mezin dihatin kîrin û ifadê wan  
di eleniya wan da dihate verge-  
randin. Van buyera ji min va aş-  
kera bû, ji ber ku min kurdi dîza  
mibû. Ü ji ber ku ez gelek cara li  
di ji xelediyê tercumana derdi-  
ketim û dawêñ wan nerm dîkirin,  
heyeta mehkemê bî çavê  
dijminati li min mîze dîkirin.Bî  
kurtayı li mehkeman,li girtige-  
han û li her der li qırkırina gelê  
kurd tê gerandin. Min bi xwe  
çerxa dewleta Tîr ji nêz va dit  
û baş nas kîr...


Bî şirovekirina vi welatparêzi,  
barbariya cunta faşist carek din  
hate aşkerakirin. Daxwaziya me  
ewe ku hemû azadixwaz, aşiti-  
xwaz û mirovhizên dinê rewşa  
gelê kurd bîbinin û li diji cunta-  
ya faşist rawestin.



I



II



III

ADRESS/NAVNIŞAN:

RISSNELEDEN 55,NB  
172 44 SUNDBYBERG/SWEDEN

**MASSKORSBAND**

